 Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)

 wergera ji erebî: Mustefa Reşîd

# Tîrêjên Çarşembê

## Xelek - 34

# Sûbarî: Kok û warê wan

Dema ku erdnîgariya milletekî jê tê standin, dîroka wî jî wenda dibe. Erdnîgarî û dîrok du tiştên bi hev va girêdayî ne, û ji hev nayên cudakirin. Çi ziyan bê serê yekî ji wan, yê din jî ziyanê dikişîne. Ev tişt rêzik û rastiyeka dîrokî ye. Çarenûsa şaxê *sûbarî* ji pêşiyên gelê Kurd di vê babetê da nimûneya herî diyar û aşkera ye. Ev şax bûye gorî û qurbana tezwîr û tewandina belgeyên dîrokî li Rojhilata Navîn. Di rastiyê da, ew *Aşûriyên pêşînin*, lê belê welatê wan, dîroka wan, navê wan û xwedayên wan *Aşûr* jê hatine standin. Emê dawer û belgeyan li ser vê yekê pêşkêş bikin.

Ka em di destpêkê da bipirsin?

## Gelo Sûbarî kî ne?

Navê "*SU- BIR*" (*Sûbîr*) yan jî "*SU- BAR*" (*Sûbar*) di nivîsên *Eannatum* (dora 2470 - 2430 b.z), padîşahê bajarê *Legeş* ê sûmerî da hatiye. Wisa tê xuyakirin ku ev nav ji du peyvan pêkhatiye (*Su, Bar*). *Sûmeran* ji mirovê *sûbarî* ra digotin "*Lu- su- aki*". Di hin nivîsên *sûmerî* din da, ji wan ra gotine "*Lu- lu- Subur*", yanê "*gelê Sûbûr*"[1]. Helbet hêjayî gotinê ye ku em bêjin peyva "*lu /lo*" heya niha jî di kurdî da ji bo gazîkirina mêran tê gotin, ji kuran ra "*law*" tê gotin û ji bo gazîkirina keçan "*lê*" tê gotin.


Paşê *Akkadiyan* paşkîta "-*tum*" bi navê wan xistiye û wisa li ba wan bûye "*Subartum*" (*Sûbartûm*). Di pey ra, ji bo sivikahiyê, gotine "*Subartu*" (*Sûbartû*). *Aşûriyan* bi şêwazê "*Şûrawa*" yan jî "*Şupria*" tomar kiriye[2]. Sami El-Es'ed dibêje: "**Demeka dirêj beşek ji bakur-rojhilatê Îraqê bi navê "Subaru" (Sûbarû), yan jî "Subartu" (Sûbartû) dihate naskirin. Peywendiya vê peyvê bi herhal bi Sûbaran ra heye; ew gelê ku li başûrê Îraqê bi cih û war bû, dema Sûmerî hatin wê herêmê. Em niha derbarê wan pir kêm tiştan dizanin. Di pey ra, Babiliyan peyva "Sûbarû" bi maneya "bakur" bi karanîne**"[3]. Ev tê wê maneyê ku "*Sûbarî*" hên pêş "*Sûmeran*" ji çiyayên Kurdistanê daketine û gihîştine başûrê Mêzopotamiya.

Dîrokzan piştrast dikin ku *Sûbarî* ne ji koma gelên *Samî* (biyabanî) bûne, nasnameya wan çiyayî-zagrosî bû. Li gor agahdariya ku dîroknasê keldanî *Amir Hanna* Fettûhî ji dîrokzan û pisporê arkêologiyê *Horst Kelinxl* wergirtiye, "*Şûbarî*" (*Sûbarî*) ji xizimên Gotiyên çiyayî bûne û bi ti awayî peywendiyeka wana nijadî bi *Amûrriyên* (*Babiliyên*) samî ra tinebû û dibêje ku *Gotî* û *Sûbarî* hevpeymanên hev bûn li dijî padîşahiya *Babil*; û herêma "*Şûbarû*" (*Sûbartû*) ku paşê bi navê "*Aşûr*" hate bi navkirin "**piraniya gel, yanê zorbeya wî, ji nijadê Şûbarî bû ku di nav wan da, yên ku ji Sûmerên kevin (rûniştivanên resen yên herêma bakur) mabûn jî, nixumî bûn**"[4].

Di jêderan da hatiye ku padîşahê sûmerî "*Shulgi ben Ur- Nammu*" (ji 2095 - 2048 b.z. serdarî kiriye) çend êriş li dij êlên çiyayê Zagros kirine û hin herêmên êlên *Sûbartû* li bakurê deştên Mêzopotamiya talan kirine. Wisa tê xuyakirin ku Sûbarî piştî demekê li dijî wî raperîne. Ji nameyên di navbera wan da tê zanîn ku peywendiyên navbera wan tûj bûne, lê negihîştine asta şer[5]. Ev tê wê maneyê ku *Sûbarî* heya wê radeyê bi hêz bûn ku "*Shulgi*" nexwastiye bi wan ra têkeve şerên giran.

## Erdnîgariya Sûbartû:


Zorbeya erdnîgariya *Sûbartû* ya nawendî dikeve rojhilatê çemê Dijle, navbera çemê Zapê jorîn û Zapê jêrîn. Ew jî ew herêm bi xwe ye, ya ku paşê bi navê "*welatê Aşûr*" hate binavkirin. Erdnîgariya *Sûbartû* di nivîsên babilî da, di heyama padîşah *Hammurapet* (1792 - 1750 b.z.) da bi şêwazê "*matum elitum*", yanê (*welatê jorîn*) hatiye. Piştî wê Farisan nav li vê herêmê kirine "*Gohestan*", yanê (*welatê çiyan*). Di jêderên erebî-îslamî da jêra gotine "*Qohistan*" û "*Bilad El-Cebel*", yanê (*welatê çiya*)[6].



(Sûbartûya Nawendî)

Helbet, li gor rewşên siyasî, erdnîgariya *Sûbartû* berfireh û teng dibû. Di hin deman da piraniya herêmên Kurdistana niha girtiye nav xwe; ji Kermanşahê da bigire heya bi kenarên Derya Sipî; herêma "*Alalakh*" (*Alalax*) li deşta Ĥemqê jî di nav da ku berdemawiya deşta Cûmê ye li herêma Efrîn ya kurdistanî. Herweha Erdnîgariya *Sûbartû* herêma "*Gotium*" li beşê navîn yê çiyayên Zagros, herêma "*Arapkha*" (*Arapxa*, Kerkûk) û kaniyên çemê Ferat, herêmên Amed li bakurê Kurdistanê û herêmên Cizîrê li rojavayê Kurdistanê digirtin nav xwe[7].

Di demeka piştî wê da, erdnîgariya *Sûbartû* di navbera padîşahiya "*Aşûr*" ku li ser axa wê hate avakirin û padîşahiya "*Kaşşû*" (ji pêşiyên gelê Kurd) da hate beşkirin. Di hin demên din da, navê "*Sûbartû*" tenha li beşekî biçûk ji padîşahiya "*Mîttanî*", ya horî hate kirin[8].



(Sûbartûya gewre)

Di dema ku tevlihevî li başûrê Mêzopotamiya pêkhatibû da, *Sûbaran* padîşahiyek avakiribû. Di pey ra, *Ammûriyên* samî herêma nawendî ya welatê *Sûbartû* talan kirin û di destpêka hezarsala duwem b.z. da dagîr kirin û kirin nawenda wê dewleta ku bi navê "*Aşûr*" hate naskirin. Hinek ji *Sûbaran* çûn herêmên çiyayî û yên mayîn di civaka aşûrî nû da hatin nixumandin heya radeyekê ku *Babiliyan* êdî *Sûbariyên* resen û *Aşûriyên* samî ji hevdu cuda nedikirin[9].

## Sûmerî û Sûbarî:

Arkêologê amerîkî *Norman Bancroft Hunt* gotiye ku herêma *Sûbartû* di bingehê da warê *Sûmeran* bû. Lê belê êlên *sûbarî* çiyayî pile bi pile ew herêm standin; cara dawî li dor sala 2250 b.z. bû. Bi sedema jiyana wan ya şivantî di konan da dijiyan û desthilata xwe dan ser cotkarên çandiniyê yên *sûmerî*, bac û bêşên giran avêtin ser wan. Ji lew ra, *Sûmeran* bi hejmareka mezin koçî başûrê Mêzopotamiyayê kir[10].

Dr. *Sami El-Es'ed* dibêje: **Navên pir bajarên Sûmeran ne navine sûmerî bûn; ew navine sûbarî (Feratiyên pêşîn) bûn; wek bajarê Ûr, Erîdû, Ûrûk, Sîpar, Larsa, Legeş û hwd. Dema ku em li pir peyvên sûmerî temaşe dikin, em digihînin wê baweriyê, hinek ji wan dibe ku sûbarî bin**[11].

Tiştekî dinî hevbeş di navbera *Sûmeran* û *Sûbaran* da heye; ew jî kîta "*su*" ye ku di navê herdû gelan da heye. Cudahî tenha di kîta duwem "*mer*" û "*bar*" da ye. Hin dîroknasan gotiye ku şêwazê akkadî yê navê "*Sûmer*" şêwazê "*Shumer*" û "*Shumerd*" (*Şûmer, Şûmerd*) bûye û şêwazê akkadî yê navê (*Sûbartû*) di bingehê da "*Shubaru*" û "*Shubiria*" (*Şûbarû, Şûbiriya*) bûye. Careka din tê xuyakirin ku kîta bingehîn "*Shu*" (*Şû*) di navbera herdu navan da hevbeşe û cudahî tenha di kîta duwem da ye[12].

Bi gelemperî gelek dawer û belgeyên nijadî û çandî hevbeş di navbera *Sûbaran* û *Horiyan* da hene ku emê wan paşê bi navbikin. Wek hemû pêşiyên Kurdan, heya niha jî navê "*Sûbarî*" di navê êla kurdî gewre "Zîbarî" da maye. Ev êla kurdî li herêma Behdînan (beşê bakur ji Herêma Başûrê Kurdistanê) dimîne û ev herêm bi xwe beşekî bingehîn ji erdnîgariya *sûbarî* bû.

Çarşemb, 18.11.2015

# Jêder

[1] Cemal Reşîd Ehmed: Kerkûk di heyamên kevin da, rûpel 24, 55.
[2] Cemal Reşîd Ehmed: Kerkûk di heyamên kevin da, rûpel 55.
[3] Sami Se'id El-Ehmed: Sûmerî û şaristaniya wan, rûpel 4.
[4] Muhemed Beyyûmî Mehran: Dîroka Îraqê ya kevin, rûpel 186. Amer Hanna Fettûhî: Keldan ji destpêka zeman, rûpel 43,153.
[5] Muhemed Beyyûmî Mehran: Dîroka Îraqê ya kevin, rûpel 181, 182, 183. Tewfîq Suleyman: Lêkolîn li şaristaniyên rojavayê Asiyaya kevin, rûpel 148.
[6] Cemal Reşîd Ehmed: Kerkûk di heyamên kevin da, rûpel 55. Yaqût El-Hemewî: Ferhenga welatan, 1/172, 2/103.
[7] Gernot Wilhelm: Horî, rûpel 29. Cemal Reşîd Ehmed: Kerkûk di heyamên kevin da, rûpel 25, 27. Hary Sager: Mezinahiya Aşûr, rûpel 29. Ebdulhamid Zayed: Rojhilata Hemdem, rûpel 561.
[8] Muhemed Beyyûmî Mehran: Dîroka Îraqê ya kevin, rûpel 344. Cemal Reşîd Ehmed: Kerkûk di heyamên kevin da, rûpel 39.
[9] Hary Sager: Mezinahiya Aşûr, rûpel 29. Ebdulhamid Zayed: Rojhilata Hemdem, rûpel 81, 188. Muhemed Beyyûmî Mehran: Dîroka Îraqê ya kevin, rûpel 325.
[10] Amer Hanna Fettûhî: Keldan ji destpêka zeman, rûpel 100.
[11] Sami Se'id El-Ehmed: Sûmerî û şaristaniya wan, rûpel 47.
[12] Georges Roux: Îraqa kevin, rûpel 119. Amer Suleyman, Abdulhekim El-Zenun: Bîreweriya yekem, rûpel 24.